Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :997 | 18-Îlon- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Ji aliyê Kompanya Tirkiyeyê ve nûjenkirina peykerê Azadî bû sedema bertekên Iraqiyan

**Ji ber ku Tirkiye rojane bi berdewam xaka Iraq û Herêma Kurdistanê dagir dike, sivîlan qetil dike, xwezayê û zeviyên çandiniyê wêran dike, ji aliyê kompanyayekî Tirkiyeyê ve nûjenkirina Peykerê Azadiyê ku bûye sembola Bexdayê bû sedema nerazîbûna Iraqiyan.**

Peykerê Azadiyê li Meydana Azadiyê ya parêzgeha Bexdayê di sala 1961'an de ji aliyê hunermendê navdar ê Iraqê Ciwad Silbim ve hatiye çêkirin. Dirêjahiya wê 15 metre ye û li Bexdayê bûne çavkaniya şoreş û xwepêşandanan. Her wiha weke sembola parêzgeha Bexdayê jî tê dîtin.

binpêkirinên xwe berdewam dike. Aborînas Niwar Seedî da zanîn ku pêwîste hikumeta Iraqê destwerdan û binpêkirinên ji aliyê Tirkiyeyê ve li ser xaka Iraqê tên pêkanîn rawestîne.

Di meha borî de projeya nûjenkirina balefirxaneya Musilê hatibû dayîna du kompanyayên Tirkiyeyê ku Serokwezîrê Iraqê Mistefa Kazimî bi xwe berê yekem yê balefirxaneyê danîbû. Vê yekê li pey xwe nerazîbûnên tund li pey xwe anibû. Piştî wê yekê berê ku ji aliyê Kazimî ve hatî danîn hat şkandin û xirakirin.

Xwepêşandan û nerazîbûnên xelkê Iraqê yên li hember danûstandinên bazirganî û hilberîna hikumeta



Kompanyayek Tirkiyeyê ya bi navê 'Gorcam' niha Peykerê Azadiyê yê li Bexdayê nûjen dike. Tevî ku kompanyayê ragihandibû ku wê peyker bê pere nûjen bike jî, lê çavkaniyek ji Wezareta Geştuguzariyê ya Iraqê ji Rojnews'ê re eşkere kir ku hikûmetê ji bo nûjenkirina peyker bûdce veqetandiye.

Ji aliyê kompanyaya Tirkiyê ve nûjenkirina peykerê Azadiyê rê li ber nerazîbûnên kolanên Bexda vekir û destnîşan dikin Kazimî hertim serî li ber Erdogan ditewîne.

Welatiyên parêzgeha Bexdayê ji Rojnews'ê re di derbarê mijarê de axivîn û diyarkirin ku ji aliyê kompanyayekî Tirkiyeyê ve nûjenkirina Peykerê Azadiyê tê wê wateyê ku Wezareta Geştuguzariyê ti nirx nade xwîna welatiyên Iraqê. Her wiha gotin ku ji ber ku dewleta Tirk welatiyên Iraqê qetil dike û Iraqê ya li gel Tirkiyê ji ber êrişên dewleta Tirk yên bê navber li ser Herêma Kurdistanê û Iraqê tê kirin û binpêkirina serweriya xaka Iraqê ye.

Artêşa dewleta Tirk a dagirker di 20'ê Tîrmehê de li gundê Perex ya Zaxoyê komkujî pêkanî. Di êrişa dewleta Tirk de 9 welatî hatin qetilkirin û 33 jî birîndar bibûn.

Hêjayî gotinê ye her wiha di 29'ê Tebaxê de balefirek bi çek û bê mirov a dewleta Tirk a dagirker li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) malek kir hedef. Di encama êrişê de welatiyê bi navê Ebuzêd Abdulah ku bavê 6 zarokan bû hat şehîd xistin.

Hîna jî êriş û bombebaranên dewleta Tirk a dagirker bê navber li ser xaka Başûrê Kurdistan û Iraqê didome.- ***ROJNEWS***

# Di 5 mehan de seyr û sefera dinyayê

**Di dema ciwaniyê de gelek kes dikevin pey xeyalên xwe û dixwazin xeyalên xwe pêk bînin.**

Di dema ciwaniyê de gelek kes dikevin pey xeyalên xwe û dixwazin xeyalên xwe pêk bînin. Lê xeyala Mack Rutherford ku hîna ew ciwanekî 17 salî ye, ne ji xeyaleke ji rêzê bû. Wî xwest bi balafirekê li seranserî dinyayê bigere û di vî warî de bibe kesê herî ciwan yê ku bi teyarê li seranserê dinyayê geriyaye. Wî vê xeyala xwe di dawiyê de pêk anî. Piştî 5 meh û rojekê şûnde li mala xwe vegeriya, wî gotibû heta ez gera xwe temam nekim ez ê porê xwe nequsînim. Mack Rutherford bi porê xwe yê dirêj vegeriya û bû xwedî serketineke ku zû bi zû kes nikare pêk bîne.

**Li bajarê Sofya dest bi sefera xwe kir**

Mack Rutherford gava 16 salî bû, di Adara 2022'an de dest bi rêwîtiyê kir. Wî li bajarê Sofya yê Bulgarîstanê dest bi rêwîtiyê kir û herî dawî piştî ku 5 mehan û rojekê li dinyayê geriya dîsa hat teyara xwe li heman cihê danî. Mack Rutherford bi teyara xwe ya ku navê wê "Sharky" ye vê gera xwe ya dinyayê pêk anî. Wî bi temamî li 52 welatan geriyaye bi vê teyara xwe.

Rêwîtiya wî ya herî dirêj a di vê gerê de ya ji Japonya ber bi Emerîkayê bû. Ew qederê 10 saetan li asîman ma da ku xwe bigihîne Emerîkayê. Bilindahiya




wî ya herî zêde jî li Meksîkayê bû. Bi qasî 12.500 fît bilind bûbû. Her wiha ew di nav şert û mercên dijwar yên avhewaya gelek welatan de vê rêwîtiya xwe temam kir. Gava ku ew di 24'ê Tebaxê de li Sofyayê vegeriya hay jê çêbû ku ew bi vê rêwîtiya xwe ketiye "Pirtûka Guinneess ya Rekoran" jî. Wî bi tena serê xwe ev yek pêk anî.

Xwîşka Mack Rutherfor, Zara Rutherford jî eynî weke wî beriya çend salan bi serê xwe dîsa bi teyareyekê li dinyayê geriyaye û ew jî weke jina herî ciwan ya ku bi tena serê xwe li sernaserê dinyayê geriyaye tê zanîn.-***Ozgurpolîtîka***

Sudoku:Pirs 7

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | | 6 | | 9 | 8 | | 7 | |
| 5 | | 8 | | | | | | |
| | | 7 | | | | 3 | | 5 |
| | 5 | | | | | 7 | | 2 |
| | 7 | | 8 | 5 | 2 | | 6 | |
| 4 | | 2 | | | | | 9 | |
| 7 | | 5 | | | | 4 | | |
| | | | | | | 8 | | 3 |
| | 8 | | 9 | 2 | | 6 | | 7 |

Sudoku: Bersiv 6

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 4 | 1 | 7 | 3 | 8 | 5 | 6 | 9 |
| 9 | 6 | 8 | 4 | 5 | 1 | 2 | 7 | 3 |
| 3 | 5 | 7 | 2 | 9 | 6 | 1 | 8 | 4 |
| 7 | 8 | 2 | 5 | 1 | 3 | 4 | 9 | 6 |
| 6 | 9 | 5 | 8 | 4 | 2 | 7 | 3 | 1 |
| 4 | 1 | 3 | 9 | 6 | 7 | 8 | 5 | 2 |
| 8 | 7 | 4 | 6 | 2 | 9 | 3 | 1 | 5 |
| 1 | 2 | 6 | 3 | 7 | 5 | 9 | 4 | 8 |
| 5 | 3 | 9 | 1 | 8 | 4 | 6 | 2 | 7 |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | N | A | Q | O | S | ■ | J | ■ | B |
| 2 | ■ | M | ■ | X | I | M | Î | R | E |
| 3 | S | A | R | ■ | B | Î | N | E | R |
| 4 | A | D | ■ | S | Ê | ■ | G | ■ | X |
| 5 | Q | E | R | S | ■ | M | E | D | ■ |
| 6 | Î | ■ | O | ■ | P | E | H | Î | N |
| 7 | ■ | A | J | O | ■ | C | ■ | L | O |
| 8 | E | W | ■ | D | Û | A | J | O | ■ |
| 9 | M | A | W | E | ■ | Z | ■ | K | A |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | | | | ■ | | ■ | |
| 2 | | | | ■ | | | | | |
| 3 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 4 | | | | | ■ | | | | ■ |
| 5 | | ■ | | | | | | | |
| 6 | ■ | | ■ | | | | ■ | | |
| 7 | | | | ■ | | ■ | | | |
| 8 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 9 | | ■ | | | | ■ | | | |

**ÇEP-RAST**


1. Kulîlka ziqûmê
2. Navê perestgeha mesîhiyan... Navçeyeke Mêrdînê
3. Edalet
4. Nêrîn... Zadê ku piranî ji bo xwedîkirina sewalan tê çandin
5. Erkedarê ku di keştiyan de xizmeta rêwingan dike
6. Îrade... Notayek
7. Xweliya piştî şewatê... Rengek
8. Sendîkaya Karkeran a Swêdê... Mektûb
9. Ajala xwedî têjik... Qralê sewalan

**JOR-JÊR**

1. Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye... Beyreq, sembola welatan
2. Daçekek ku wateyê xurt dike... Roja em tê de ne
3. Ardê ku ji ber bêjingê maye
4. Ava qirêj a piştî şûştinê... Peyva neyînî
5. Dîwarê ku ji xaliyê hatiye çêkirin... Nimûne
6. Di Bektaşîtî û Mewlewîtiyê de birakê terîqetê
7. Rengek... Ji pêncan yek zêde
8. Ferişteyên bihuştê
9. Genimê hêrandî... Cihê ku nan tê de tê pehtin

# Qêrîna gelê Kurd ya li dijî tecrîdê

Têkildarî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Mizgîn Hesen diyar kir ku, dewleta tirk ya dagîrkir ji bo şkandina vîna gelê Kurd, biryarên navneteweyî binpê dike. ***R-4***





Farûk Sakik

**Paradîgma, berê wan dide Îmraliyê**

Heger azadiya Rêber Apo parêzerên 22 welatan eleqeder bike, tê wê wateyê ku êdî 'dem dema azadiya Rêber Abdullah Ocalan e' ***R-4***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 997 | 18-Îlon- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# OPERASYONA 'MIROVÎ Û EWLEHIYÊ' BI SERKET LÊ, XETER DIDOME



## Qonaxa duyem ya operasyonê Holê bi encam bi dawî bû

Hêzên Ewlekariya Hundirîn bidawîkirina qonaxa duyem ya Operasyona 'Mirovî û Ewlehiyê' ragehand û diyar kir ku li gorî pêwîstiyê, opereasyonên hêzên wan yên li dijî şaneyên DAIŞ'ê di nava Kampa Holê de wê dewam bike. ***R-3***

## 'Bila rejîma Sûrî ji bîr neke ku tirkî dagîrkerê xaka Sûriyê ye'

Ezher Ehmed bibîra hukumeta Şamê anî ku, yê despêkê agirê şerê li Sûrî gur dikir û ji bo ruxandina Sûriyê hemû derfetên xwe xistine xizmeta çeteyan de, dewleta tirkî bû û got, çareserî tine lihevkirinek Sûrî- Sûrî de ye.***R-5***



## KNK : Li hemberî êrişên Îranê yên li dijî jinan divê gel dakeve kolanan

KNK'ê kuştina Jîna Emînî ya ji aliyê hêzên dewleta Îranê ve bi tundî şermezar kir û bang li gel kir ku li dijî wan êrîşên dakevin kolanan û nerazîbûnê nîşan bidin. ***R-3***

## NY: Tirkiye gelek caran sûcên şer kiriye

Serokê Komîsyona Lêpirsîna Sûriyeyê ya Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku êrişên ku Tirkiye li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û li herêmên dagirkirî dike, di çarçoveya sûcên şer de ye. ***R-5***



## Di 4 mehan de 10 helîkopter li kur û çawa hatin xistin



Di 30 salan de 48 helîkopterên artêşa Tirk hatin xistin, di 4 mehên dawîn de 10 helîkopterên artêşa Tirk li Herêmên Parastinê yên Medyayê hatine xistin. ***R-2***

## Zanîngeha Rojava ji bo sala nû xwendekaran tomar dike



Bi sedan xwendekarên herêma Cizîrê navê xwe li Zanîngeha Rojava qeyd dikin, xwendekaran diyar kirin ku Zanîngeha Rojava xwin û hêviyên wan pêk tîne. ***R-6***

## Jin xebat û xizmetguzariya şaredariyan pêş dixe

Rêvebera Ofîsa Jin ya Şaredariya Gel ya kantona Hesekê Reşa Salih, bal kişand ser giringiya pêşketina jinan di warê xizmetgizariyê de û got, divê jin evayiya astengiyên ku pêşî li serketina wê digrin, derbas bike û di karê xwe de serkeftî be. ***R-2***

# Jin xebat û xizmetguzariya şaredariyan pêş dixe

Rêvebera Ofîsa Jin ya Şaredariya Gel ya kantona Hesekê Reşa Salih, bal kişand ser giringiya pêşketina jinan di warê xizmetgizariyê de û got, divê jin tevayiya astengiyên ku pêşî li serketina wê digrin, derbas bike û di karê xwe de serkeftî be.

**Darîn Silê/Hesekê**

Ji ber ku di şoreşa Rojava de jin roleke pir girîng û mezin dilîze, şoreş bi navê wê tê nasîn. Jin di her warî de cihê xwe girt û hêza xwe ji tevayiya cîhanê re diyar kir. Herwiha di warê pêşxistina xizmetguzarî û aboriya civakê de jî gelek kar û xebat daye meşandin û bi awayekî aktîf projeyên biçûk û mezin pêk aniye. Yek ji xebatên herî girîng yên jinê Ofîsa Jinê ya şaredariya Gel ya Kantona Hesekê ye ku Sê ofîsên jin girêdayî wê ne, Ofîsa Safiya Twêna Til bênder. Herwiha ji tevayiya pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê jin di van Ofîsan de dixebitin û jimara wan bi giştî bi giştî 95 e.

Derbarê rola jinê di warê aborî, hizmetguzarî û civakî de bi taybet di şaredariyan de rêvebera Ofîsa Jinan ya şaredariya gel li Kantona Hesekê Reşa Salih, da zanîn ku jin roleke pir mezin di warê pêşxistina xizmetguzariya de lîst û derfet da jinê ku hê zêdetir aktîf bibe

Xebata û rêxistina jinê di nava şaredariyê de

Reşa diyar kir ku xebatên jinan di şaredariya gel de li ser du beşan tê dabeşkirin û axaftina xwe wiha domand: “Beşa yekê rêxistinî ye, ev beş xebatên jinan di şaredariyê de birêxistin dike û bi giştî rewşa rêxistinî ya jinan birêve dibe. Beşa duduyan jî çavdêriya projeyên jinan dike û karê wan dişopîne.”

Reşa bal kişand ser awayê xebata wan di pêkanîna projeyên ku ji bo wan tên pêşniyarkirin û wiha pê da çû: “Li her şaredareriyê koordînasyonek jinan heye, ku biryarên têkildarî jinan lêkolîn dike û çavdêriya wan dike. Herwiha ev Koordînasyon di projeyên têkildarî jinan de jî biryaran dide. Ji bo wê



jî dema projeyek hebe em pêşkêşî koordînasyona giştî dikin û piştî ku Desteya Rêveberiya Herêmî û Ekolojîk li ser projeyê erê dike, em dest bi pêkanîna projeyê dikin.”

Reşa têkîldarî xebatên rêxistinî yên jinan di nava şaredariyê de destnîşan kir ku ew her hefte semîner dibinin û wiha direjî da axaftina xwe: “Ji bilî semînerên hefteyê, em di perwerdeyê girtî û vekirî de jî derbas dibin û ji bo çareserkirina tevayiya zehmetî û astengiyên li pêşiya jinan di nava şaredariyê de em her mehê civînan li dar dixin. Herwiha em rewşa jinên li derveyî şaredariyê jî dişopînin û komîn û kampên koçberan jî dişopînin da ku pirsgirêkên wan jî çareser bikin.”

Reşa destnîşan kir ku wan di van çend salên borî de gelek proje pêk anîne û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Hejmara projeyên ku me pêk anîn bi gihişte 8 in, ev proje Sûdeke mezin li civakê kir. Îsal jî, me li ser du projeyan kar kir, yek jê projeya çandina daran ku tê de 4 hezar dar hatin çandin, ya din jî çeksazkirina baxçeyek li taxa Kelasê bû. Jixwe projeya herî bi sûd û mezin ya çandiniyê bû ku 25 jin tê de kar kirin. Herwiha got, di dema pêş de emê projeyên xwe zêdetir bikin û hewl bidin rêxistinbûna xwe di nava şaredariyan de xurtir bikin. Lewra rol û xebata jinê di şaredariyan de pir girînge û bandoreke erênî li civakê jî dike.”

**`Jin li hember zehmetiyan bû xwedî biryar`**

Reşa da zanîn ku wek jin ji destpêka karê xwe yê di nava şaredariyê de rastî gelek zehmetî û astengiyan hatine û axaftina xwe wiha domand: “Di destpêka kar de ya herî zêde bandor li me kir urf û edetê civakê yê bi zihniyeta zilamê desthilat hatîn farzkirin bûn. Digotin bila jin li kêleka mêr nexebite û ne xwedî biryar be. Lê jin li hember vê yekê sekinî û bû xwedî biryar, niha jî wek jin em karê xwe birêve dibin û cihê xwe di nava civakê de diyar dikin.”

**`Dewleta tirk li dijî pêşketin îradeya jin e’**

Reşa got, dagîrkeriya Tirkî hertim êrişî kar, xebat û destkeftiyên me



dike û hewl dide karê me bide seknandin û wiha pê da çû: “Dibe ku gef û êrîşên dagirkeriya Tirkî yên ser herêmên me bandorê li karê me bike, lê dîsa jî em karê xwe nadin sekinandin û li dijî êrişan xebata xwe bihêztir û zêdetir dikin. Ji berk u em dizanin zîhniyet û sîstema tirkiyê li dijî jina azade û îradeya jinê her tim ji xwe re xeter dîtiye.”

**`Jinên têkoşer, teqez serkeftinê bi dest dixin`**

Rêvebera Ofîsa Jinan ya Şaresariya Gel li Kantona Hesekê Reşa Salih di dawiya axaftina xwe de got, di bingeha hemû serkeftinên civakê de îrade û tekoşina jinê diyardeye. Herwiha da zanîn ku jinên têkoşer, biryardar û xwedî îrade, digihêjin armanca xwe û serkeftinê bi dest dixin.

# Kongra Star : Birêxistinkirin Zarokan û parastina mafên wan erka me ye

**Zana Roj/Şehba**

**Endama Kordînasyona Kongreya Star a herêma Efrînê Fatma Silêman diyar kir ku ji ber êrişên dagirkeriyê yên ser herêmê, zarok di rewşeke zehmet re derbas dibin û got, erka me ya sereke xwedîderketina li zarokan û birêxistinkirina wan e.**

Ji ber rewşa koçberî û êrîşên li ser herêmê de tên kirin û bandoriya wê ya mezin ya li ser derûnî û pîskeolojiya zarokan, Kongira Star li herêma Şehbayê dest bi xebatên xwe yên ji bo rêxistinkirina zarokan kir. Kongira Star di gîştî Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xebat rêxistikirina zarokan û parastina mafên wan dike .

Derbarê mijarê de endama Kordînasyona Kongir Star a herêma Efrînê Fatma Silêman ji rojnameya me re axivî.

Fatma Silêman bal kişand ser avakirina komîteya rêxistinkirina zarokan li herêma Şehba û wiha got: “Li ser asta Bakur û Rojhilatê Suriyê ev yekem komîte hatiye avakirin. Ev 3’ê meh in em li herêma



Şehbayê xwe birêxistin dikin, di hundir kamp û navçeyan de komîteyan ava dikin, her wiha di saziyên girêdayî zarokan de, yên wekî Desteya Perwerdê, kevana Zêrîn û Yekîtiya Rewşenbîran de xwe bi cih dikin. Zarokan ji temenê 8 heyanî 14 salî di nava xwede dihewîne.”

**’Xwedî derketina li zarokan erka me ye’**

Fatma diyar kir ku ji bo bêbanorkirina reşa şer ya serr derûniya zarokjan , ew çalakiyên taeybet jiu bo zarokan pêşkêş dikin û wiha got: “ji ber rewşa zehmet ya ku tevayiya herêmêm me tê re derbas dibin, xwedîderketina li zarokan pir girînge. Ji bo ku rewşa şer û koçberiyê bandoreke xerab li ser pîskeolojiya zarokan neke, divê parastina wan di cihê guncav de were kirin. Li ser vê bingehê hin cihên taybet ji wan re hatin ava kirin, bi taybet di kampan de. Em hewil didin ku barneme û çalakiyên taybet yên girêdayî pêşketina zarokan bidin pêşxistin, weke xwendina çîrokan û lîstokên ku enerjiya wan aktîv dikin û pêş dixin.”

**Di pêvajoyê helwesta zarokan derdikeve”**

Endama Kordînasyona Kongir Star Ya herêma Efrînê Fatma Silêman da xuyakirin êrişên ser herêmê tên kirin di serî de zarokan dike armanc û axaftina xwe wiha qe-



dand: “Plan û êrişên ser herêmê tên kirin, kal, pîr, zarok û tavahiya gel dike armanc. Weke ku tê zanîn di demên derbasbûyî de komkjî de derheqê zarokan de hatin kirin, me xwest zorok jî li hember van kiryaran helwestên xwe nîşan bidin, û bikaribin dengê xwe bighînin raya gîştî, ev yek jî bi riya daxuyanî û çalakiyan tê derketin. Hêviya me ew e ku em zêdetir vê xebatê bi pêş bixînin, em bibin destek ji bo tevahî zarokên ku di şer re derbas bûne, em zêdetir bikaribin li rex xwendin û rewşa wan ya malbatî bibin wargeha pêşketinê û wan hembêz bikin.”



# “Bi keda destên xwe reng didin Jiyanê”

Yek ji hunerên destan yên jinan a herî qedîm teşî ye. Jin bi teşiyê, sembola dirokî ku çanda qedîme diparêzin

Ji destpêka mirovahiyê heta roja me ya îro, jin bi keda destên xwe ji bo malbat, cîran û civakê, berheman çêdikin; ji bo derdora xwe, gore, papik, qazax û hwd. bi keda dest û çavên xwe çêdikin. Yek ji hunerên destan yên jinan a herî qedîm teşî ye. Jin bi teşiyê, sembola dirokî ku çanda qedîme diparêzin. Jinan berê bi riya teşiyê rîs dirêsan bi wê rîsê papik, gore û qazax bi zarok, malbat û cîranên xwe re dihûnandin.

Rêvebere Çand û Hunerê ya Navenda Hêzil a Navçeya Tirbespiyê ya girêdayî Kantona Qamişlo - Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Iptîhal Mehmûd ku ji zaroktiya xwe ve xwasteka wê ji karên destan ên hunerî re heye, der barê karên destan de axivî.

**“Min di zaroktiya xwe de ji karên destan hez dikir’’**

Iptîhal Mehmûd diyar kir ku ji zaroktiya xwe ve ji karên destan hez kiriye û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Min ji zaroktiyê ve ji karên destan hezd ikir, ev hezkirin jî bû sedema derbasbûna merheleya seretayî û navîn ku paşê min li Peymangeha Hunerên Bedew li bajarê Qamişlo- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xwend û bi dawî kir. Niha jî ez di Navenda Çand û Hunera Navçeya Tirbe Spiyê ya bajarê Qamişlo- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, zarokan fêrî karên destan dikim. Ez gelek kêfxweş dibim dema ku jinên ciwan tên vî karî fêr dibin.”

**“Ji bo min ev kar hunerek e”**

Iptîhal Mehmud wiha behsa girîngiya karên destan dike: ‘’Dema min dest bi vî karê kir û heta niha ez pir kêfxweş û bi xwestek kar dikim. Ji ber ku ji zaroktiyê ve hezkirineke min ji vî karî re heye lewma dixwazim jinan fêrî vî karî bikim. Gelek kes dema dibînin ez vî karî dikim pirs dikin, dibêjin çawa tu vî karî dikî? Dema ez vî karî dikim bêhna min fireh dibe û li gel min civakîbûn çêdibe. Bi taybetî di demsala zivistanê de çêkirina berhemên destan ji bo min gelek xweş tê. Karên destan ji min re bûye weke hevalek, dema ez çênekem hîs dikim ku di jiyana min de kêmbûnek çêdibe, ji ber



ku karên destan bûye parçeyek ji jiyana min. Di heman demê de, dema ez dibînim ku daxwaza kesan ji bo karên destan çêdibe kêfxweş dibim. Ji bo min ev kar hunerek e.”

**‘’Bi riya karên destan civakîbûn ava dibe’’**

Iptîhal Mehmûd da zanîn ku ew çanda dayika xwe ji bîr nake ji bo bi pêş bixe her dem hewl dide û wiha got: ‘’Ji berê ve dayika min jî karên destan çêdikir, gelek model hene ez nizanim lê dayika min dizane. Dayika min tiştên kevin çêdike, ez jî yên nû çêdikim. Gelek model hene em ji hev fêr dibin. Berê li gundan jin bi hev re kom dibûn û gore, papik, qazax çêdikirin. Ji ber ku civaka berê û ya niha ne wekî hev e, kombûn di dema niha de kêm e. Ez dixwazim bi riya karên destan civakbûnê ava bikim.”

**‘’Berhemên jinan kombûna wan nîşan dide’’**

Iptîhal Mehmûd herî dawî da zanîn ku ew di dema pêş de dê pêşengeha hunerên destan vekin û wiha dawî li axaftina xwe anî: ‘’Em amadekariyên pêşengehê dikin, armanca me ew e ku di destpêka zivistanê de pêşengeha xwe li dar bixin. Jinên ku niha tên li vir fêr dibin, xwe ji bo pêşangehê amade dikin. Em hemû karên destan çêdiken mîna cilên zarokan, bûkan, nexşê, malan û kefiyeyan jî ji bo jinan. Jinên ku van çêdikin di dema pêşangehê de dixwazin berhemên xwe bifiroşin. Her wiha yên din jî em ê li navendê bihêlin. Ji ber ku tiştên em çêdikin ne ji bo şexsek in ne ji bo saziyê ne. Jixwe di dereceya yekem de daxwaza min a çêkirina karên destan kombûn e, berhemên karên destan kombûna jinan nîşan dide. Jin bi riya karên destan tên gel hev. Ez niha ji bo dema pêş projeyên nû ava dikim.”

***JINHA***

# Zarokên Balekayetî fêrî hunerê dikin

**Li Balekayetî ya ser bi Hewlêrê, komek kesên bi hunerê re mijûlin, zarokan fêrî hunerê dikin. Armanca dewreyên perwerdeyê ewe ku, zarok ji hunerê dur nemînin û heskirina wan ya li hemberî hunerê zêde bibe.**

Li Balekayetî di bin navê pêşxistina hunera şêwekariyê, di nava xwezayê de zarok bi pergalên cuda cuda fêrî hunerê dibin. Bi vê pêngavê tê xwestin ku zarok berê xwe bidin hunerê. Ji bo ve jî komek kesên beşa huner xilaskirin, li



herêmê dewreyên perwerdekirinê dane destpêkirin. Bi taybet armanca dewreyên perwerdeyê fêrkirina şêwekarî ya ji bo zarokane.

Kanî Kameran ku jinek ciwane ku dibistana Koleja Hunerên Xwe-



şik qedandiye li ser vê yekê ji Rojnews’ê re axivî. Kanî Kameran destnîşankir ku huner li herêmê pir lewaz bûye û ji holê radibe, lewra çend mehin bi hewldana çend hunermendên dilsoz û dilxwaz, dewreyên perwerdeyê hunerî yên bi xwestek destpêkirine.Kanî Kameran di dewama axaftina xwe de got: “Ji bo ku dubare huner vegere nava civakê û bi rengan aştî pêkwere me dest bi karek wiha kiriye. Gelek pergalên ku hatîn karanîn û xwezayê qirêj dikin ji bo bikaranîna xizkirina tabloyan bikaranîne. Kesên ku tevlî dewreyên perwerdeyê bûyîn her yek ji bo xwe weke hunermendek bûye. Em dikarin bêjin ku reng û huner piştî sistbûnê careke din vegeriya ye herêmê.”

Kanî Kameran her wiha da zanîn ku difikirin hewla xwe tenê di çarçoveya dewreyan de nehêlin, weke perwerdeyên berfireh ji civakê giştî re bidin da ku zarokên xwe



fêrî giringiya hunerê bikin ku bibe beşek mezin yê şêweyê jiyanê û didomîne: “Me soza berdewamiyê daye û di nava hefteyê de dem dem diçin nava xwezayê de û reng û xwezayê tevlîhev dikin. Yan jî em li cihekê kom dibin û bi pergalên cuda hunerê çêdikin.”


Her wiha yek ji zarokên ku tevlî dewreyên perwerdeyê dibe Sarîn Cemal diyar kir ku ji biçûkatiyê ve heskirina wê a fêrî hunerê bûyînê hebû û wiha axivî: “Di berê de ji ber ku kesek yan cihek nebû, min ne dikarî xwe fêrî hunerê bikim. Lê bi destpêkirina vê perwerdeyê re min kariye fêrî gelek tiştên cuda bibim û niha tişta ku min dixwest gelek fêrbûme. Niha em dikarin hemû rengan bikarbînin û tevilhev bikin ku rengên cudatir derbixîn. Em niha hemû bûne hunermendên baş û em dikarin bi pergalên xwarinê û keviran karên hunerî yên xweşik çêbikin.”

***ROJNEWS***

# Li Ser ‘Kirasekî Sor’ Çandên Dinyayê

**Projeyeke ku 13 salan dewam kir, bi dawî bû. Ev proje ku ya kirasekî balkêş bû û navê wî “Red Dress” (Kirasê Sor) bû bi temamî 13 salan dewam kir.**

Projeyeke ku 13 salan dewam kir, bi dawî bû. Ev proje ku ya kirasekî balkêş bû û navê wî “Red Dress” (Kirasê Sor) bû bi temamî 13 salan dewam kir. Hunermenda Ingilîz, Kiristie Macleod bi riya neqişandina li ser vî kirasî, xwest balê bibe ser çand, nasname û rêûresmên



dinyayê. Ji 46 welatan 343 neqaş û hunermend tevlî vê projeyê bûn û her yekê/î ji çanda xwe tiştek li vî kirasê sor zêde kir.

Kirasê sor ji 84 pîneyan pêk tê. Her hunermendekê/î ango neqaşekê/î li gorî serpêhatiya welatê xwe tiştên ku nasnameya wan îfade dikin, li vî kirasê sor zêde kir ango pê ve pîne kir. Di nav van hunermendan de penaber û her wiha kesên ku di vî hunerî de şareza ne, û kesên ku hîna nû hînî vî hunerî dibin jî tevlî vê xebata 13 salan bûne.

Di nav wan kesan de tenê 7 mêr hebûne, yên mayî hemû jin bûne. Ev xebat destpêkê ji bo mirov çand û nasnameya xwe îfade bikin, dest pê kiriye lê bi demê re guheriye platformekê û gelek kesan bi saya vê projeyê xwest dengê xwe yê hatiye birrîn, bilind bike. Herî dawî piştî ku ev proje bi dawî bû, çend hunermendan ew li xwe kir û bi vî awayî proje temam bû.

Kirasê Sor niha derketiye gerê, di 17 û 27 Îlonê dê li Qahîreya Misrê wê were nîşandan. Her wiha dê di 8 û 27’ê Cotmeha 2022’yan de jî li Welatê Galiyan, li “Navenda Huner ya Melville” wê were nîşandan. Lê wekî din dê siberojê li gelek welatên din jî were nîşandan.

***Ozgurpolîtîka***

# Qêrîna gelê Kurd ya li dijî tecrîdê

Têkildarî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Mizgîn Hesen diyar kir ku, dewleta tirk ya dagîrkir ji bo şkandina vîna gelê Kurd, biryarên navneteweyî binpê dike.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Ji bo mafdayîna gelê Kurd û tevayîya gelê bindest, ji bo jiyaneke bi rûmet bi taybetî ji bo azadiya jinê, Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan ev 24 salin ji aliyê dewleta tirk ya dagîrker ve di girtîgeha Îmraliyê de hatiye dîl girtin. Lê Rêber Apo jî li hember vê faşîzma ku dixwaze di şexsê wî de gelê kurd qir bike, têkoşîneke bê sînor di meşîne û ev 24 sala armanca dijminê geelê kurd vala derdixîne. Tekoşina ku di tecrîdekê pir giran ji aliyê Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan vet ê meşandin, hêza berxwedanê û hêviya serkeftina azadiyê dide gelê wî. Herwiha li seranserê cîhanê gelê Kurd, dostên kurdan û gelê azadîxwaz, ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Apo çalakiyên cûrbecûr li dar dixin.


Derheqê tecrîda giran ya li ser Rêber Apo, rêvebira Radyoya Xabûr Mizgîn got, divê bi têkoşîn û berxwdana gelê Kurd, tecrîd bê şkandin û Rêber Apo azad bibe.

**`Dewleta tirk tecrîdeke giran li ser Rêbertiyê dide ferzkirin`**

Rêvebira Radyoya Xabûr, Mizgîn Hesen balkişand ser têkoşîna Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan û got, ew ji bo berjewendî û azadiya gel, li hember cîhanê sekinî. Her kes dizane ku, projeyeke wekî ya Rêber Apo li seranserê cîhanê nîne. Ev projeye li dijî sîstema kapitalist ya ku civakbûyînê ji hole radike ye. Herwiha ji bo azadiya jinê û vegera heqîqeta mirovahiyê ye. Lê hêzên serdestên ku her tim gel dikin koleyên xwe, li hember vê projeyê bi hemû hêza xwe bûn kelem. Lewra ev proje siyasta wan ya faşîst pûç kir. Li hember siyaseta wan, bû alternatîfa jiyanekê nû.

**`Li hemberî tecrîdê berxwedaniya bê hempa`**

Mizgîn bal kişand ser biyarên derheqê girtiyan û wiha got: " Ji mafê her girtiyekî heye ku hevdîtinê bi malbata xwe re pêk bîne, lê dewleta tirk heta mafê girtiyan jî binpê dike. Li tevayîya cîhanê ji mefê hemû girtiyan heye ku, bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtinê pêk bîne. Lê dewleta tirkî ya faşîst maf û hiquqa binpê dike. Li her tişt li gor faşîzma xwe dîzayn kiri ye. Berxwedana Rêber Apo ya li hember vê faşîzmê jî dewleta tirkî berbi rûxandinê ve dibe. Lewra dewleta tirk tecrîdeke herî giran li ser Rêbertiyê ferz kirî ye."



**`Azadiya jinê azadiya civakê ye`**

Herwiha Mizgîn bi bîr xist ku projeya Netewa Demokratîk ya Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan, ji ber ku jin û civakê berbi azadiyê ve dibe, dewleta tirk ya faşîst ji xwe re xeter dibîne û got, ji bo wê dewleta tirk ya dagîrker bi hemû hêza xwe ve, ji hemû aliyan êrişî gelê kurd dike. Ti kes nikare vê yekê înkar bike ku, jin azad be wê civak jî azad be. Lewra bala tevayîya azadixwazên cîhanê li ser paradîgmaya Netewa demokratîk e. Ev yek jî ji bo berjewendiyên desthilatan yên şexsî xetera herî mezin e.



**Erka ragihandinê…**

Rêveberi Radyoya Xabûr, Mizgîn Hesen bal kişand li ser erk û rola çapemeniyê ya ji bo rakirina tecrîda giran û axaftina xwe wiha bi dawî kir : "Wek xebatkarên çapemeniyê erkê me ye ku em, bala cîhanê tev bikşînin ser tecrîda giran ya li ser Rêber Apo. Herwiha ne tenê Rêber Apo di girava Îmraliyê de rastî tecrîda giran tê, bi hezaran mirovê ku doza mafê azadiya gel dikin, bê sûc û bê sebeb di girtîgehên dewleta tirk de gîrtîne û rastî îşkencekê giran tên. Ji bo wê erkê me ragihandina azad e ku em bibin dengê gelê xwe û em vê bê huquqiya tên kirin ragihinin cîhanê. Herwiha divê em qêrina gelê kurd ya li dijî tecrîda li ser Rêber Apo bigîhînin her derê cîhanê da ku sazîyên qaşo mafê mirovan diparêzin jî ji xwe şerm bikin û helwesta xwe zelal bikin."

# KJK: Şehîd Delal Nûrhak û Zîlan Qamişlo bi şoreşa jinên re bûn yek

**Navenda Nûçeyan**

**KJK diyar kir ku şehîd Delal Nûrhak û Zîlan Qamişlo rêya wan ronî kirin û bedew kirin û got, Em soz didin ku li Kurdistanê şoreşa demokratîk û şoreşa jinê pêk bînin, hesab ji dijmin bixwazin û her tim xwedî li bîranîna şehîdan derkevin**



Ji bo bîranîna Şehadeta fermandarên YJA Starê Delal Nûrhak û Zîlan Qamişlo, Koordînasyona Jinên Kurdistanê KJK daxuyaniyek da.

KJK'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku şoreşa Kurdistanê bi dayina berdêlên mezin hebûna xwe ya azad destnîşan kir û wiha got: "Şoreşa jinê bi berdêlên mezin, azadî û pêşketinê diafirîne û şehîdên me di meşa şoreşê de rêya me ronî dikin. Herî dawî di êrîşa artêşa Tirk a faşîst de ya li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê, hevalên me Delal Nûrhak û Zîlan Qamişlo şehîd bûn. Yên ku rêya me ronî dikin ev hevalen e û bi fedakirina canê xwe şoreşa jinê mezintir kirin. Em soz didin ku li Kurdistanê şoreşa demokratîk û şoreşa jinê pêk bînin, bi vî rengî hesab ji dijmin bixwazin û her tim xwedî li bîranîna wan derkevin "

KJK'ê da xuyakirin ku şehîd Delal Nûrhak û Zîlan Qamişlo meşa şoreşa jinê li çiyê, gihand asta herî bilind û wiha domand: "Şehîd Delal bi şoreşa jinê re bû yek, jiyan û têkoşîna xwe bi vî rengî meşand û cihê xwe di gelek çeperên şoreşê de girt, li her qadê bi hevrêtiya xwe, bi hêz û hunera xwe ya milîtanî şopeke mezin li pey xwe hişt. Herwiha Şehîd Zîlan Qamişlo jî li ser bingeha civakîbûna şoreşa jinê û têkoşîna li dijî DAÎŞ'ê, li Rojava dest bi têkoşînê kir û meşa şoreşa jinê li çiyê gihand asta herî bilind. Her ku mezin bû hîn bêhtir bi nirx, Rêbertî, Partiyê û azadiya jinê ve hate girêdan, bi zanebûn xwedî lê derket û bi vê têgihiştinê armanca xwe mezintir kir."

Koordînmasyona Jinên Kurdistanê KJK'ê di dawiya daxuyaniya xwe de, di şexsê Şehîd Delal, Şehîd Zîlan hemû şehîdên xwe yên şoreşê bi bîr anî. Herwiha diyar kir ku ewê bi daxwaz û biryardariya serketinê karê xwe zêde bikin."



**Paradîgma berê wan dide Îmraliyê**

**Farûk SAKIK**

Rêber Apo ji 15'ê Sibata 1999'an vir ve li Îmraliyê di şert û mercên tecrîdeke giran de tê girtin. Ji destpêka rojên Îmrali heta îroj li ser Rêber Apo her tim tecrîd heye. Herî dawî di encama zextên raya giştî de, di sala 2021'ê de bi rêya telefonê bi birayê wî re hevdîtineke gelekî kurt hat kirin.

Armanc; qutkirina pêwendiya Rêber Apo ya bi civakê re ye. Çima dixwestin ku vê pêwendiyê qût bikin? Rêber Apo di hemû hevdîtinên xwe de bal kişandiye ser aştî û çareseriyê. Ev helwesta wî hin aliyan, ango aliyên şerxwaz aciz dikir. Wan nedixwest ku aşitî pêk were û neçareseriya li Îmraliyê jî astengkirina aştiyê bû.

Dîsa di hedefa wan de parêzer hebûn. Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan di 11 salên dawiyê de tenê 5 caran hevdîtin bi parêzerên xwe re kiriye. Çima parêzer tên asteng kirin? Ji bo ku di hevdîtinan de parêzname jî dihatin parvekirin. Ev parêzname wek ansiklopedî ya çareseriya pirsgirêkan bû. Di salên destpêka Îmraliyê de, civak bi salan li benda rojên hevdîtina bi parêzeran re bû. Peyamê ji wê derê dihat, bi rojan dihatin nîqaşkirin. Dem hat ev 'notên hevdîtinan' di qada navneteweyî de jî, hatin meraqkirin. Aha ev yek bû sedem ku komploger û rejîma Tirkiyê tecrîda giran bidin destpêkirin û hevdîtinên parêzeran jî bidin seknandin.

Di peymanên neteweyî û navneteweyî de mafê girtiyan heye ku timî bi parêzerê xwe re hevdîtinê pêk bînin. Pêşîlêgirtina hevditina parêzeran bêhiqûqî ye. Mînak, hevdîtin berê bi hincetên wekî "keştî xerabe ye" û "rewşa hewayê nebaş e" dihatin astengkirin, lê di salên dawî de serlêdanên tên kirin, an bêbersiv tên hiştin an jî bi hinceta cezayên dîsîplînê tên redkirin.

Dema ku li deverek hiqûq nema, êdî bersiv jî nadin serlêdanên mafxwaziyan. Li Îmraliyê li hemberî Rêber Apo hiqûqa dijminatiyê tê bikaranîn. Dewlet xwe mafdar dibîne û li gorî xwe bersiv dide hiqûqa navnetewî. Di van salan de, êdî pêdivî bi hincet û belgeyan jî nabîne. Bi du îspatan jî nakeve.

Ceseretê, ji sîstema komploya navdewletî digire. Cesaret, ji xemsariya CPT û DMME digire. Dema em li peymanên sazî û dezgehên navdewletî dinêrin, eşkere ye ku tiştên tên kirin li dijî hiqûqê ne, binpêkirina mafan e. Dê bifikirin, di 10'ê hezîranê de Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê (OHD) jî di nav de 770 parêzerên 29 baroyan, ji bo hevdîtin bi Rêber Apo re bê kirin, kampanyeyeke îmzeyê dan destpêkirin. Hiqûqnasan îmzeyên ku berhev kiribûn, di 10-17'ê Hezîranê de radestî Wezareta Dadê kirin. Lê wezaret hê jî bersiva serlêdana parêzeran neda ye.

Li gel vê di 14'ê Îlonê de ji 22 welatan, 350 parêzer ji bo hevdîtin bi Rêber Apo û girtiyên din re pêk bînin, serî li Wezareta Dadê dan. Dîsa bersiv nayê dayin. Bi van hewldan û serlêdanan, carek din hat îspatkirin ku Rêber Apo di vê serdemê de ji bo mirovahiyê, xwedî rol û mîsyonek çawa ye.

Baş e… çima ev mirov evqas ji bo Rêber Apo seferber dibin? Gelek kesan di navbera salên 2013 û 2015'an de, di dema hevdîtinên Îmraliyê de, derfetên naskirina Rêber Apo dîtibûn. Bawerî anîbûn ku bi paradigma û ramanên wî wê aştî û azadiya cîhanê pêk bîne. Ji ber vê yekê ye roj bi roj li cîhanê ji bo azadiya Rêber Apo, têkoşînek tê meşandin. Heger azadiya Rêber Apo parêzerên 22 welatan eleqeder bike, tê wê wateyê ku êdî 'dem dema azadiya Rêber Abdullah Ocalan e'



# 'Bila rejîma Sûrî ji bîr neke ku tirkî dagîrkerê xaka Sûriyê ye'

Ezher Ehmed bibîra hukumeta Şamê anî ku, yê despêkê agirê şerê li Sûrî gur dikir û ji bo ruxandina Sûriyê hemû derfetên xwe xistine xizmeta çeteyan de, dewleta tirkî bû û got, careserî tine lihevkirinek Sûrî- Sûrî de ye

**Şaho Gaber/Qamişlo**

Di demên dawî de gotegotên li ser hewldanên lihevkirina di navbera hikumeta Şamê û dewleta tirk ya dagîrker zêde bûn. Piştî civîna li Soçiyê ya di navbera Erdogan û serokê Rûsyayê Vladimîr Pûtîn de, ku di 5'ê Tebaxê de hatibû lidarxistin, Tirkiyê diyar kir ku Rûsya hewl dide têkiliyên Şam û Enqereyê asayî bike. Erdogan jî eşkere got, lihevhatina bi hikumeta Şamê re, rêya çareserkirina aloziya Sûriyê ye.

Derbarê hevildanên lihevkirinên di navbera hikumeta Şamê û dewleta Tirk ya dagirker û li hemberê planên qirkirina kurdan erkê gelên herêmê, Endamê Desteya Rêveber Ya Meclisa Sûriya Demokratîk Ezher Ehmed ji me re axivî.

Ezher Ehmed diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker bi armanca têkbirina projeya Rêveberiya Xweser hewl dide bi hikumeta Şamê re li hev bike û wiha got: "Dewleta Tirk a dagirker ji bo şerê li dijî Kurdan û têkbirina projeya demokratîk a Rêveberiya Xweser hewl dide, bi hemû dewletan re li hev bike. Lê, divê rejîma Şamê ji bîr neke ku, ji destpêka aloziya Sûriyê ve di 2011`an de, dewleta Tirk piştgiriya oposîzyona Sûriyê kir û xaka Sûriyê dagîr kir. Ev lihevkirina di radeya yekemîn de dê zirarê bigihîne hikumeta Şamê."



**'Armanac sereke ya dagîrkeriya tirkî pêkanîna mîsaqa milî ye'**

Ezher Ehmed bal kişand ser planên dewleta tirk ji bo pêkanîna Osmaniya nû û wiha got: "Dagirkeriya Tirk ji bo pêkanîna xewina Osmaniya nû, dê her tiştî bike. Lewma divê hikumeta Şamê bizane ku, di kîjan mijarê de be jî wê lihevkirinên bi dewleta Tirk re, bibe sedema îflaskirina wê. Piştî civîna Tehranê, Rûsya xwest dewleta Tirk bi fermanên wê tevbigere û li pêşiya NATO û Amerîkayê ji bo berjewendiyên wê kar bike. Dewleta Tirk ber bi hilweşandina aborî û siyasî ve diçe, ji ber wê ger Rûsya bikare dewleta tirk û rejîma Şamê li hev bîne, dê aloziya Sûriyê kûrtir bibe."

**'Li hevkirina rejîma Şamê ya bi tirkî re wê bibe dawî ya Suriyê'**

Ezher Ehmed bîr xist ku dewleta Tirk di aloziya Sûriyê de roleke pir xerab lîst û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dewleta Tirk bi îdiaya ku Kurd dixwazin Sûriyê parçe bikin, ji destpêka aloziya Sûriyê ve destwerdan kir û piştgiriya opozîsyonê kir. Rasterast êrişê deskeftî û serkeftinên li dijî DAIŞ'ê çêbûyîn kir û xaka Sûriyê dagîr kir. Her kes dizane ku dewleta Tirk a dagirker demografiya herêmên dagirkirî guherandiye û bi ser xaka xwe ve kirin mîna Lîwaa Îskenderon, divê hikumeta Şamê bizane ku dewleta Tirk ji herêmên ku dagîr dike dernakeve. Ew dixwaze projeya Osmanî Nû pêk bîne."

**'Divê her kes bi erkê xwe yê ehleqî rabe'**



Endamê Desteya Rêveber Ya Meclisa Sûriya Demokratîk Ezher Ehmed da zanîn ku ji bo têkbirina planên dagirkeriya tirkî, yekîtiya gelên herêmê pêwîste û axaftina wiha qedand: " Tişta ku gelên bakur û rojhilatê Sûriyê tê xwestin, yekîtî û hevgirtina xwe bihêz bikin. Dema ku gelên herêmê li ser bingeha Şerê Gelê Şoerşgerî tevbigerin, wê êrişên dagîrkeriya tirkî têk biçin. Herwiha divê gelên herêmê li dora Hêzên Sûriya Demokratîk kom bibin û piştgiriya wan bikin. Ji mirovekî ku li ser xaka bakur û rojhilatê Sûriyê jiyan dike, tê xwestin bi erkê xwe yê exlaqî rabe û li dijî dagîrkeriyê têbikoşe. Divê tevaiya partiyên siyasî yên herêmê ji bo berjewndiyên gelên herêmê xebatê bikin. Herwiha divê komkujiyên dewleta tirkî ya dagîrker ji bîr nekin. Bersiva herî rast ji êrişên dewleta tirk ya dagirker re Şerê Gelê Şoreşgerî ye."

# NY: Tirkiye gelek caran sûcê şer kiriye

**Navenda Nûçeyan**

**Serokê Komîsyona Lêpirsîna Sûriyeyê ya Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku êrişên ku Tirkiye li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û li herêmên dagirkirî dike, di çarçoveya sûcên şer de ye.**

Komîsyona Lêpirsîna Sûriyeyê ya Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî rapora Sûriyeyê ya ku xwe dispêre lêpirsînên li herêmê û serdema 1'ê Çileyê – 30'ê Hezîrana 2022'yan, eşkere kir. Bi beşdariya Serokê Komîsyona Lêpirsînê Paûlo Pînheîro, endamên komîsyonê Hann Magally û Lznn Welcham civîneke çapemeniyê hate lidarixistin û rapor hate eşkerekirin.

**Pînheîro: Li Sûriyeyê binpêkirinên mafên mirovan û alozî zêdetir bûye**

Serokê Komîsyona Lêpirsînê Paûlo Pînheîro derbarê raporê nirxandin kir û got "Sûriye nikare şerekî berfirehtir hilgire lê dibe ku welat ber bi vê rewşê ve diçe."

Serokê Komîsyonê Pînheîro diyar kir ku li Sûriyeyê binpêkirinên mafên mirovan û alozî zêdetir bûye û bal kişand ser gef û êrişên ku Tirkiye li hemberî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike. Pînheîro derbarê vegera kesên ji Sûriyeyê jî got "Ji bo vegerê divê hilbijartinek were kirin, divê veger ewle, bi rûmet û ji dil be."

Di raporê de hate diyarkirin li ser axa Sûriyeyê hemû aktorên çekdar çalak in û hate diyarkirin ku li ser sivîlan û warên sivîlan êriş didomin, azadiya îfadekirinê tê astengkirin, mal û milk tên desteserkirin. Di raporê de hate diyarkirin ku ev tişt di çarçoveya sûcên şer de ne.

**Li Efrînê destgîrkirin, êşkence, windakirin, êrîşên zayendî pir zêde bûye**

Di raporê de qala binpêkirinên mafên mirovan ên hêzên hikumeta Sûriyeyê û ya çeteyên li Îdlîbê hate kirin û di heman demê de bi awayekî berfireh qala êrişên li ser Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê hate kirin. Ev herêm di bin dagirkeriya dewleta Tirk û komên çekdar ên girêdayî wê de ne. Di raporê de hate diyarkirin ku'Artêşa Millî ya Sûriyeyê' û hêzên girêdayî wê li Efrînê sûcên şer piştî sala 2021'an zêdetir kirine û hate gotin "Sivîlên ku tê îddîakirin têkiliya wan bi hêzên Kurd û Rêveberiya Xweser hene, bi awayekî kêfî tên destgîrkirin, êşkence li wan tê kirin û hinek jê piştî ku tên destgîrkirin tên windakirin. Aqûbeta hinek kesan jî nayê zanîn. Jinên ku tên destgîrkirin û girtin jî êrîşên zayendî li ser wan tê kirin."

**'Artêşa Tirk milkiyetên taybet nas nake'**

Di raporê de hate diyarkirin ku li qadên di bin kontrola Tirkiyeyê de heke binpêkirinên mafan were kirin, berpirsê vî tiştî Tirkiye ye û û hate gotin "Artêşa Tirk û tûgayên 'Artêşa Millî ya Sûriyeyê' ji bo armancên xwe yên leşkerî milkên sivîlan bi kar tînin. Wekî mînak ji sala 2020'an ve tê astengkirin ku şêniyên Kurd ên gundê Davûdiyê yê herêma Serêkaniyê vegerin warên xwe, mala gelek kesên ji wan hate hilweşandin. Li gorî dîmenên ji peykê baregehên artêşa Tirk û tesîsên wê hê jî hene. Artêşa Tirk milkiyeta taybet desteser dike û mafê tazmînatê yê gundiyan tune dihesibîne, ev jî tê wateya ku binpêkirina hiqûqa mirovî ya navneteweyî."

**'Êrişa Kobanê di çarçoveya sûcê şer de ye'**

Di raporê de qala êrişên ku Tirkiye û çeteyên girêdayî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dikin jî hate kirin. Di raporê de qala êrişa di 8'ê Çileya 2022'yan de ya li Kobanê hate kirin û hate gotin "Ev êrîş bi hawanên 120 mm yên ji Tirkiyeyê hate kirin. Di vê êrişê de sivîlekî jiyana xwe ji dest da û zarok û jin di nav de 12 kes jî birîndar bûn. Ji bo ku mirov bibêje ev êrîş di çarçoveya sûcê şer de ye sedemên maqûl hene. Ji ber ku di vê êrişê de kesên sivîl hatine kuştin û birîndarkirin."



Di raporê de qala êrişên ku Tirkiye bi dronên çekdar dike jî hate kirin û hate gotin ku di van êrişan de kesên sivîl dibin hedef.

Di raporê de qala bûyerên li kampên Hol û Rojê û êrîşên DAIŞ'ê jî hate kirin. Di raporê de bang li dewletan hate kirin ku bila hemwelatiyên xwe yên li kampan werbigirin û bang li QSD'ê hate kirin ku ji bo pêşîgirtina mirinên li kampan divê ji bo lêpirsînan gavên zêdetir biavêje.

Ev rapor wê di 22'yê Îlonê de li Ofîsa Cenevreyê ya Neteweyên Yekbûyî de wê pêşkêşî Rûniştinên Mafên Mirovan a 51'emîn were kirin.